

# Stêrk wiha diçirisin

Hayku

Şahnaz Yûsif

# Stêrk wiha diçirisin

Hayku

2020

Şahnaz Yûsif

**Navnîşan a pirtûkê :stêrk wiha diçirisin**
**Nivîskar : Şahnaz Yûsif**
**Mijar :Hayku**
**Sal a weşanê:2020**
**Jimar a ropelan : 74 rûpel**
**Jimar a rûnivîsan : 500 rûnivîs**
**Desgina berganû neverok:Kosret Burhan**
**Çapkirin : cara yekê**
**Der a weşanê :herêma Kurdistan a Iraqê**

Pêşgotin :

Wêjaya Kurdî, mîna wêjeya gelên din, her gav di geşedan û pêşveçûnê de ye, deriyê xwe ji derbasbûna çureyên nû yên .wêjeyî re vekiriye, Hayku jî yek ji wana ye
Kurd bi dehê salan Hayku nasdikin ,lê torevan û helbestvan derng lê guhdankirin, di dawiya sala du hezaran de,hin karên tekan e derketin , li vir û wir nivîs û deq hatin wergerandin û weşandin, lê piştî pêşkeftina teknolojiyê û belavbûna kara-nîna tevnên civakî, stêrka hayku bi Yaneyên Facebookê û yên din re ronî da, û Kurd jî xwedî pişkekê bûn, ji ber ku min di 2017-an de rûpelek Facebook-ê çêkir, û ji vir rêwîtiya haykuya Kurdî dest pê kir, û piştî du salan me Beşa Latînî jî saz kir, bi alîkariya komek hevalên li Rojava, di bin seroka-tiya xwişka me Dr. Shahnaz Yûsif de, ji bo ku peyama haykuya Kurdî bigihîne ber destê xwendevanan,gelek .zehmetî kişand û bi şev ta şeveqê di ma

Pirtûk radije navnîşana
(Stêrk wiha diçirisin)
komek deqên hayku pijîjka Şahnaz dabîn dike û
bi dîmenên (sînografiya )bedew û zaravekî bilind û bi rêyên ciyawaz newaz dike
mijarên wê pirin , hin jê surištî ne û hin ji jîngeha derdorê ne, herwiha liser mirov û beza wî ya rojane ,bi saya hest û dilînîyen kesayetî yên ku Şahnaz nîgar kiriye mîna tabloyekê di deqên xwe de

Milko Ahmed
Damezrênerê Yaneya Hayku ya Kurdî

# Hingûr,
# li ser baskên şehînge_
# xilmaşî ne xewn !!

# Ronahî,
# tarîtiyê derbas dike_
# Bê şikestin

**Ronahî,**
**ji derziyê derdikeve;**
**ta yê hevgirêdanê !!**

# Ronahî,
# Ji hev dixe tarîtiyê_
# tîrêja elendê

# Ronahî,
# ji şewtandinê re dikşîne_
# Pirpirîkan!!

**Derîkî kêlekdayî,**
**Na raweste ji reprepê_**
**çavê bendewar!!**

Ewrekî bi baran,
arana dil av dide_
girnijîna te !!

**Birûsk û tav,**
**bi evînê dibarin_**
**çiruskên çavên te....**

Hêlanek vala,
bi hêviyan mişt e_
Jinek xewnedar!!

Heyvek ronîdar,
Berve pêşbirkê dikin _
Pirpirîkên dil !!

Şev e,
Li ser perdan dijenin_
awazên hêviyan

Dû heyv in,
giliyan bi hev dikin
Stêrk matmayî ne

Roniya heyvê,
pirepira çûkên giyan e_
Herkandina hestan e!!

Evîna kûr,
li ber pêlan xweragirin_
Şopên me !!

Çilmisî ne,
çandiniyên li qiraxan_
çem ziwa ye!

Ewra sibihê,
ji hêviyan re vekirî ne_
Pencere !!

Ewrek sipî,
qeliştî li bendê ne;
lêvên ziwa!!

Zerbûyî,
Xwe li qorçikan digrin_
Pelên ketî!!

Darê payîzê,
li ba dibin biskên zêrîn_
Kejên lewend !!

Li eywanê
Fîxanek tê,
li gulê digerim ez!!

Bê sûd,
bi çuqlî girtiya_
Hinara payîza çûyî

Çuqlîkî şikestî,
Li ber ba liba dibe_
bêkes!!

Lat in,
yek pişta yên dî digire_
Pirek sirûştî !!

Ji derzên pencerê,
qeliştî dibîne _
heyva spehî !!

Kolanên bênav,
Kaja me ya kevnar_
navnîşan e!!

Li bin sîwanê
xwe diparêze_
sîk dişewite !!

Li bin sîwanê,
çavan şil dike_
barîna bîranînan!!

Dengê zarokan,
li ber derî_
Zingilê cejnê ye

Li pişt deriyan,
zarokên cilrengîn_
Pirpirîkên rekihan!!

Pirpirîkê zeviyan;
li kirasê keçkokê;
dikin civîn!

Sirûda sibehê,
Li hev vedigerînin_
Çivîk û berşîr!!

Di nav striyan de,
ketiye hev_
Xecxecokek naz !!

Binefşek bêhndar,
di nav nuxumên payîzê de_
jibîrkirî ye

Gula sor,
bendên evînê ristî ne_
Reng û bîn

Gula berbero,
Şipê li ser tixûban;
zêrevana sînor e!!

Gula berbero ,
li pey min diçin _
Çavên te !

Kulîlka lotusê,
bi zivirîneke vedibe_
Kirasê derwêş!!

Dilê zêrîn,
aramiyê belavdike _
Zerbeybûn !!

Lehî ye,
Liber diçin peya û rê_
Cudagirtina kêlekdayî!!

Girên berfî,
li serhev paldayî _
Konên penaberan

Li welat,
rêgirê ba yê sert e_
çiyayê bilind!

# Hacîreşk,
# li dûv hev difirin_
# salên temen

Ewrên tarî,
Bar dikin refên balindeyan_
Rêkên ne diyar!!

Sar e,
hê jî çîveçîv e_
dengê azadîxwaza

Baran e,
Peşkên naz ;
Pistepistên dildaran

# Zivistan e,
# bi bîranîna dinixume_
# Qeşaya biyaniyê

Ne buhar e,
lê rok hilatî ye_
awazek ji reşmehê

Asoyê dûr
di bilûrê ve direvin
hinasên zindankirî,

Dawiya Sibatê,
li ber ketinê ye_
dîwarekî pir reng!

Di goşe yê de,
Peykerê yadgariyê ye-
Kûzê pîrikê!!

Tenûrek dadayî،
bi vînê dijene_
Dilên dayîkan

Bakî xurt e,
desthilatdariya dirûxîne-
Koşkên ji qûmê!!

Êlûn,
hema dihejin pel_
semaya xatirxwestinê

Rêyên qeliştî
Gavan winda dike
Davên veşartî

Sîtavên sêwî,
Hêsiran dibarînin_
Lal e gundo

Ewqas ceberût,
bi sîberan şa na be_
Rok...

Bihna baranê,
bê dengiyê dihilweşîne;
qebqeba kewê!!

Kesk in,
biser rejalan dikevin_
guliyên genim

Şaxên rût,
xuncên serhildayî_
şoreş lidar e...

Baxçekî rut,
dilên kesk dinuxumîne_
Dara sersalê!!

Rûtin,
Bi bayê kur xwe dinixumînin
Darên me

Her tişt rût e,
Tenê werhêl cilkirîne
Payîza welat

Dildarê firînê,
li guptekên çiya;
Hêlîna datînin....

Elend e,
bi tîrêja re ,dipişkivin;
hêvî

Bilind e,
Çivîk li ser bang didin;
Dara me

Bakî çiyayî,
Şîniyê davêjin_
Zeviyên me!

Ji gelawêjê,
Pêlan dikşîne _
_ Dil !!

Zemawendek asîmanî
gustîlkek ji stêrkan_
diyariya bûkê!!

Rû bi rû ,
dardestê sêlfî dirêj dike_
amûrîkî heyvî

Zivistanek dî,
hîn jî di dilan de diçikînin _
Singê konan

Awirên evînê,
di asîmanê çavan de_
diçirisin stêrk!!



# Meya kevnkirî
# Mêwe malê diçirise
# goşiya dawî

Ji weşanên yaneya Hayku ya Kurdî